
hejmar 7 havîn 1990

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî


Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)



Anatomiya Mirov

(dûmahîka hejmara 6)



1-57 - ORGANÊN HINDURÎN	**İÇ ORGANLAR**	**ORGANES INTERNES**	**INTERNAL ORGANS**
1- toşpî, n.m.	salgı bezi	glande	gland
toşpiya tîroîdê	tiroid bezi	corps tyroide	thyroid gland
2-3- GEWRÎ	**LARİNKS, GIRTLAK**	**LARYNX**	**LARYNX**
2- hestiyê hiyoîde	hiyoid kemiği	os hyoïde	hyoid bone
3- kirkirka tîroîdê	tiroid eklemi	cartilage thyroÎde	tyroid cartilage
4- zengilor	soluk borusu	trachée	trachea
gûzika zengilorê	Adem elması, gırtlak çıkıntısı	pomme d'Adam	Adam's apple
5- bronş	bronş	bronche	bronchus
bronşik	bronşçuk	bronchiole	bronchiole
6-7 pişik, ceger,sîpelk	ak ciğer	poumons	lung
6- pişika rastê	sağ akciger	poumon droit	right lung
7-loba jorîn a pişikê	akciğer üst lopu	lobe supérieur du poumon	upper pulmonary lobe
8- dil	yürek, kalb	cœur	heart
9- perdeya navbirê, diayafragm	diyafram	diaphragme	diaphragm
10- cegera reş, kezeb, mêlak	kara ciğer	foie	liver
11- kîsikê zirav	safra kesesi	vésicule biliaire	gall bladder
12- fatereşk, xalxalk, sipil	dalak (Arapça talak)	rate	spleen
13- asik, made	mide	estomac	stomach
14-22- RÛVÎ	**BAĞIRSAKLAR**	**INTESTINS**	**INTESTINES**
14-16- RÛVIYA ZIRAV	**İNCE BAĞIRSAK**	**INTESTIN GRÊLE**	**SMALL NTESTINE**
14- donzdetilk, donzdegirêk	oniki parmak barsağı	duodénum	duodenum
15- rûviya birçî	boş bağırsak	jejunum	jejunum
16- rûviya badayî	kıvırım bağırsak	iléon	ileum
17-22- RÛVIYA STÛR	**KALIN BAĞIRSAK**	**GROS INTESTIN**	**LARGE INTESTINE**
17- rûviya kor	kör bağırsak	caecum	cecum, caecum
18- apandîs, rûviya zêde	apandis	appendice	appendix
19- zeblota hilkêşayî		colôn ascencdant	ascending colon
20- zeblota berwarkî		colôn transverse	transverse colon
21- zeblota dakêşayî		colôn descendant	descending colon
22- rûviya dawîn, tortorîk	rektum	rectum	rectum
23- sorsorîk	yemek borusu	oesophage	oesophagus, gullet
24-25 dil	kalb, yürek	cœur	heart
24- guhik	kulakçık	oreillette	auricle
25- tîşika pêşîn a dil		sillon inter-ventri-culaire antérieur	anterior longitudi nal cardiac sulcus

Civîna Ismail Besikçi

Civîna heftemîn ya li ser zimanê kurdî, zaravê kurmancî, li Swêdê, li Biskops Arnöyê civiya. Civîn hefteyekê, ji 7ê nîsanê heta 14ê nîsanê, dom kir. Civîna bihara 1990an, îcar, bi firehî li ser termên edebî bû ku em di vê hejmarê de, beşê yekemîn yê terman diweşînin. Tevî termên edebî, hevalên beşdar li ser termên hiqûqî û anatomiyê jî xebitîn. Herçî pirsegirêkên gramatîka kurdî be, beşdar li ser rapora Reşo Zîlan, ku di derheqa rastnivisîna hin hoker û daçekan de bû, xebitîn. Em vê xebatê jî di vê hejmarê de diweşînin.

Hevalên ku beşdarî li civîna bihara 1990 an kirin ev in : Khosrow Abdollahî (Selmas), Lutfî Baksî (Xerzan), Mehmûd Baksî (Xerzan), Rojen Barnas (Diyarbekir), Cemal Batun (Mêrdîn), Joyce Blau (Fransa), Nûra Cewarî (Rewan), Firat Ceweri (Nisêbîn), Zeynelabidîn Zinar (Batman), Remzî Kerîm (Sêrt), Hazim Kiliç (Hekarî), Kendal Nezan (Diyarbekir), Zinar Soran (Mêrdîn), Mehmed Uzun (Siwêrek), Veysî Zeydanlî (Bêdlîs) û Reşo Zîlan (Agirî).


Di vê civînê de du navên nû hebûn : folklorîsta hêja Nûra Cewarî ku ji Ermenistana Sovyetî hatibû û xanima Joyce Blau ku li Zanîngeha Sorbonnê, ya Parîsê, mamosteya zimanê kurdî ye. Nivîskarê kurdê Yekitiya Sovyetî Tosinê Reşîd jî, êvarekê, hat ziyareta me. Em bi dîtina wan kêfxweş, bi xebat û pêşniyarên wan hîn têkûztir bûn.

Hevalên ku ji Rewanê hatibûn daxwaz û pêşniyar kirin ku niwênerên kurd ên Yekitiya Sovyetî jî di civînên me de beşdar bin. Me dil û daxwaz û hêvî heye ku hevalên ji Yekîtiya Sovyetî jî bikaribin di civînên bê de hazir bin û vê xebata pîroz hîn geştir û berfirehtir bikin.

Bi biryara hevalên beşdar navê vê civînê bû *Civîna İsmail Besikçi*. Herwekî ku tê zanîn, Dr. İsmail Beşikçi, nivîskar, sosyolog, ji mêj ve ye li ser doza Kurdan û pirsa Kurdistanê dixebite û wî gelek kitêb, di vî warî de weşandine. Û ji ber vê yekê, ew gelek caran hatiye girtin û bi dirêjahiya salan li zîndan û girtîxanên Tirkiyê maye. Niha, wî du kitêbên din ku li ser pirs û pirsgirêkên Kurd û Kurdistanê ne, li Stembolê, weşandine. Ji lewre, ew hatiye girtin. Ji bo nîşandana piştgirtiyê û protestkirina girtina İsmail Beşikçi, civînê telegramek ji serekkomarê Tirkiyê Turgut Özal re şand û kopiyek ji telegramê jî ji İsmail Beşikçi re bi rê kir.

KURMANCÎ

26-perdeya navbirê	diyafram diyafragm	diaphragme	diaphragm
27- fatereşk, xalxalk, sipil	dalak	rate	spleen
28- gurçika rastê	sağ böbrek	rein droit	right kidney
29- toşpiya sergurçikî	böbreküstü salgı bezi	capsule surrénale	suprarenal gland
30-31- gurçika çepê	sol böbrek	rein gauche	left kidney
30- kovên gurçikê, kalîks	böbrek piramitleri	calice	calyx
31- legena gurçikê	leğen	bassinet	renal pelvis
32- mîzkêş	sidik yolu	uretère	ureter
33- mîzdank	sidik kesesi	vessie	bladder
34-35- KEZEB, CEGERA REŞ	**KARA CİĞER**	**FOIE**	**LIVER**
34- navika kezebê	kara ciğer göbeği	hile du foie	falciform ligament of the
35- lobê kezebê	kara ciğer lopu	lobe du foie	lobe of the liver
36- kîsikê zirav	safra kesesi	vesicule biliaire	gall bladder
37-38- DUCOYA ZIRAVÎ	**SAFRA KANALI**	**CANAL CHOLÉDOQUE**	**COMMON BILE DUCT**
37- coya kezebe	hepatik kanal	canal hépatique	common hepatic duct
38- coya ziravî	sistik kanal	canal cystique	cystic duct
39- derîdamar	kapı damar	veine porte	portal (hepatic portal vein)
40- sorsorik	yemek borusu	oesophage	oesophagus
41-42- MADE, AŞIK	**MİDE**	**ESTOMAC**	**STOMACH**
41- serdevka made, aşik	mide ağzı	cardia	cardiac orifice
42- bindevka made, aşik	mide kapısı	pylore	pylorus
43- donzdetilk	on iki parmak bağırsağı	duodénum	duodenum
44- pankreas	pankreas	pancréas	pancreas



Li ser rastnivisîna çend tiştan

Reşo ZÎLAN

1. Rastnivîsîna hin daçek û hokeran

Herçendî daçekên kurdî ji çend cureyan pêk bên jî, di rastiyê de, yên bingehîn ev in; ***ji, li, di, bi, bê***. Heçî daçekên din in, êdî ew bi alîkariya van daçekên han yên bingehîn tên afirandin. Ji ber vê yekê jî, di warê rastnivîsîna daçekan de, tiştê ku em bal û dêna xwe bidinê ew e, ku divê em timî van daçekên bingehîn çu caran bi peyvine din ve nezeliqînin.

Wek:

*Cerdoyê Biro mala xwe **ji** gund guhaste bajêr.*
*«Apê min têye **ji** deştê, barek strî li piştê.»*
*Keç û xortên gundê Yekavê **li** guhera gund civiyabûn.*
*Ev koloz û ev şal û şapik xweş **li** bejna te hatine.*
*«Me ji narê diye nûra te **di** dil*
Lew ji "işqa te her ateşperes in»
Melayê Cizîrî
*Wê ev melhema han **di** birîna xwe da û pak bû.*
Gelo ew bi kurdî dizane?
*Tiştê ku hukûmetê anîbû serê me, ne **bi** dilê xelqê bû.*
*Wê şevê **bê** (bêî) wan kes nehat.*
Ez çayê bê şekir vedixwim.

Hin caran mirov dikare bi alîkariya hin peyvên din kompleksên daçekî çêbike. Ji kompleksên daçekî mebest kompeyvek (komek peyv) e, ku ji çend daçekan, yan ji yek yan jî ji çend daçek û paşdaçekekê pêk tên. Ev kompeyvên han yên daçekî dikarin bi rola rengdêr yan hokerê jî rabin. Heçî ev kompeyvên daçekî ne, bêî ku em yek bi yek li maneyên peyvên ku ew jê pêk tên bigerin û bibêjin ka ew hîç maneyekê didin yan na, divê em her yekê ji wan bi tena serê xwe binivîsin. Li milekî din jî, ji aliyê hebûna maneyê ve, bê guman her perçeyek ji wan xwedî maneyekê ye.

*Baran **ji ber** sitema axayê êlê warê xwe terikand.*
*Wî xwe **ji ser** serê çiyayê Kose berda xwarê.*
*Ez ne **ji ba** wan têm.*
*Min destê xwe **ji bin** kumê xwe derneanî.*
*Zorav **ji bilî** kara xwe tiştekî din hizir nake.*
*Ev diyarî **ji bo** destgirtiya min e.*
*Dijmin **ji pişt** çiyayê Zozikê derneketiye.*
*Ew herduk **ji hev** hez dikin.*
*Memir **ji nik** pismamê xwe têt.*
*Werin van hûrûmûrên xwe **ji rex** malê hilînin!*
*Mêvan **ji derve** hatin hundir û derbasî dîwanxaneyê bûn.*
***Li ber** dergehê koşkê pûtekî mermerîn hebû.*
*Guldank **li ser** maseyê ye.*
*Ew wê çaxê çend rojan **li ba** me mabû.*
*Gulzar **li bin** darê rûdine.*
*Tu **li hember** wî zimandirêjiyan meke!*
*Êdî Kurd **li dijî** mercên koledariyê radibin.*
*Ev yeka han ne **li gor** dilê wî ye.*
*Bager û Diljar ne **li derve** ne.*
*Ew û ev qet **li hev** naçin.*
*Eskeran hema **li pêşberî** gundê me kemîn danî.*
*Ka tu **di gel** min were bajêr, ez ê alî te bikim.*
*Here **jê re** bibêje, ku bila ew êvarê zû vegere.*
*Dilop **jê de** dihatin xwarê.*
*Ew cotesolên ku te kirîbûn, **lê** nehatin.*
*Ka **pê re** here gund û serxweşiyê bide gundiyan.*
*Em hingê jî **pê de** ketin, lê nebû.*
*Ma te ew **pê ve** zeliqand?*
*Ma min negote te, ku tiliya xwe **tê de** meke?*
*Wî derziyek **tê re** kir û pîjik derêxist.*

Heçî hokerên pêşdaçeka wan ketî û bi tenê paşdaçeka wan mayî ne, divê mirov paşdaçeka mayî bi tena serê xwe nenivîse. Wê her yekser bi peyvê ve binûse (bizeliqîne).

Wek:

Paşve, paşde, pêşve, pêşde, şûnve, şûnde, serve, serde, piştre, piştve, dûre, binre *û her wekî din.*
*Welatê me bi destê dijmin **paşde** maye.*
*Ez ê bi alîkariya vê kursê zimanê xwe **pêşve** bibim.*
*Min taştê xwar û **piştre** du îskan çay vexwarin.*
*Dibêjin **piştve** fişek berdanê.*

Lê heke çu tiştek ji daçekê neketibe û daçek, daçekeke tam be, divê qaîdeyên ku li jorê hatine behs û çêl kirin, derbas bibin.

Ango:
Hezare ***ber bi*** *gund* ***ve*** *çû.*
Wî diviya duhî ***bi dû*** *min* ***re*** *bida rê.*
Ev nîr û mercên han Kurdan her ***ber bi paş*** *ve dibin.*
Ez ê ***ji*** *sibehî* ***û pê de*** *li ser karê xwe nemînim.*
Ji êvarê ***û bi vir de*** *xew neketiye çavên dayika min.*

Ji bilî van, divê perçeyên ku di pêkanîna daçek, hoker yan jî pêşlêkerên hevedudanî de roline mezin dilîzin jî cihê û bi tena serê xwe bêne nivîsandin.

Bo nimûne:
Di nav hev de, li ser hev, di rex hev de, li dor hev, li tenişt hev, tev li hev, ser bi ser, qor bi qor, roj bi roj, gund bi gund, pel bi pel, dan ber hev, dan ser hev, dan tenişt hev û hwd.

Lê belê, eger ji wan perçeyan peyveke nû bête afirandin, ku ew peyv mefhûmek be û mefhûmeke xweser û taybetî be, êdî ew hingê bi hev re têtê nivîsandin.

Wek:
Curbicur, derbider, gorbigor, rûbirû, serejêr (=nişûv, serbijêr*), serejor* (=serbijor, hevraz, kaş*), hevber* (=wekhev*), hevgel* (= hogir, destek*), demildest* (=di wê bîskê de*), berepaş, serhevraz, kerrekerr û hwd.*

2. Rastnivîsîna raweya çêbiwar

Raweya çêbiwar (partîsîpa dema borî) ya zaravayê kurmancî bi ***-î*** û bi ***-yî*** -yê dawî tên. Lêkerên ku radera wan bi ***-in*** û ***-în*** dawî tên, mirov di şûna wan de bi tenê ***-î***- yekê, yên ku bi ***-an*** û ***-ûn***- ê dawî tên jî, mirov di şûna wan de bi tenê ***-yî*** -yekê li koka lêkeran zêde dike. Mirov bi vî awayî raweya çêbiwar ya sade bi dest dixe.

Wek:
Hatî (hatin), *ketî* (ketin), *mirî* (mirin), *kuştî* (kuştin), *kirî* (kirin)
Girî, (girîn), *firî* (firîn), *nihêrî* (nihêrîn), *perçifî* (perçifîn)
Mayî (man), *payî* (pan), *dayî* (dan), *kutayî* (kutan)
Çûyî (çûn), *bûyî* (bûn), *cûyî* (=cûtî) (cûn, cûtin)

Raweya çêbiwar ya hevedudanî jî bi alîkariya daçekên têvel têne çêkirin. Di warê rastnivîsînê de, divê mirov berî her tiştî lê binihêre ka ew raweya çêbiwar ya hevedudanî tewandî ye yan na. Eger ne tewandî be, divê ew bi hev re bête nivîsandin.

Gul û giyayên ***avnekirî*** *çilmisîbûn.*
Wî tiş tên ***jibîrkirî*** *dianîn bîra mirovî.*
Xortê ***sergermbûyî*** *bi pêsîra wî girt.*
Ew ji kesên ***navnedayî*** *ye.*
Mîha ***serjêkirî*** *hilawistin.*
Dêleseya ***dermanxwarî*** *sekitî.*
Bi ya kalê ***jihevdeketî*** *be, ew hîn jî xort e.*
Me perçeyên otomobîla ***jihevderxistî*** *dîsan li hev siwar kirin.*
Eskeran agir berda gundê ***dorlêpêçayî.***
Pereyên ***bideyndayî*** *ji kîsê wî çûn.*
Xwarina ***jibermayî*** *bû para pisîka malê.*
Eger raweya çêbiwar ya hevedudanî tewandî be, divê wê çaxê em wê bi hev re nenivîsin.

Bo nimûne:
Dîwarê ***ji nîvê de qelişî,*** *hilweşiya.*
Şêva ***ji darê ketî,*** *nedihat xwarin.*
Guletopa ***li nîveka gund ketî,*** *neteqiya.*
Rondikên ***ji çavan barî,*** *nîşana hesretê bûn.*
Navê çîroka ***di bîrê de mayî,*** *Enter Pehlewan bû.*
Gelo navê gundê ***bi bajêr ve girêdayî,*** *çi bû?*
Endamê ***ji partiyê vekişiyayî,*** *hevalê dostekî te ye.*
Kesê ***bi wî re çûyî,*** *êvarê vegeriya.*
Pêş mergeyê ***gule li hêtê ketî,*** *pak bû.*
Polîsan Mewlûda ***ji bav û kalan mayî,*** *bi xwe re bir.*

Termên çandiniyê

(dumahîka hejmara 6)

Amadekar : Hazim KILIÇ

kurdî	**tirkî**	**fransizî**	**îngilîzî**
nûber, nûbar	turfanda	primeur	early fruit or vegetable
şitil	fide	semis	seedling, young plant
miştelî	fidan	plant	plant
çevrebî	hedik		
dîndar, tirşe	Lübnan palamudu	chêne libanais	oak of Lebanon
qaç, qarç	yayvan yabancı ardıç	une variété de genévrier	a variety of juniper
evris, merx	boylu yabani ardıç	une variété de genévrier	a variety of juniper
çam	çam	pin	pine
dirî	diken	épine, ronce	thorn, thorn bush, bramble
strî	diken	épine	thorn
gers, gez	ılgın	tamaris, tamarix	tamarisk
mêw	üzüm ağacı	vigne	vine
dêlî	asma	variété de vigne grimpante	creeping vine
gûnî	geven	astragale	astragalus
MEYWE	**YEMİŞ**	**FRUIT**	**FRUIT**
hilû, alû	erik	prune	plum
hilûreşk	kara erik	prune noire	black plum
hilûzerk	sarı erik	prune jaune	yellow plum

alûçe	can eriği, yeşil erik	varieté de prune verte	variety of geen plum
qeysî, zerdele	kaysı	abricot	apricot
gêlas, gilyaz, qerasî	kiraz (yunanca kerasos'tan)	cerise	cherry
fişne	vişne (rûsça vişniya'dan)	griotte	Morello cherry
hirmê	armut	poire	pear
girsk, şekok, karçîn	yaban armudu	poire sauvage	wild pear
hejesor, parz, sinc	iğde	éléange	oleaster
şîlan	kuşburnu	églantier	dog rose
kezwan, şengêl	çitlembik, menengüç	térébinthe	terebinth
xêxik	son baharda yetişen yaban eriği	prune sauvage d'automne	autumnal wild pear
helhelok	kızılcık	cornaline	cornel berry, cornelian cherry
beybûn	sarı sümbül	marguerite	daisy
sosineber	papatya	camomille	cammomilla
sosin	süsen (farsça sûsen'den)	iris	iris
helale	lale (farsça)	tulipe	tulip
nêrgiz	nergiz (yunanca narkisos'dan)	narcisse	narcissus
yasemîn, asmîn	yasemin	jasmin	jasmine
salep	salep	orchis	orchis
kaktûs	kaktüs (yunanca kaktos'tan)	cactus	cactus
hêro	Hatmi çiçeği	mauve	hollyhock, marsh mallow
mijmijok	sığırdili	buglosse	bugloss
sûs	meyan	réglisse	licorice
mêxik, qerefîl	karanfil (yunanca karyonfilon'dan)	oeillet, girofle	carnation
binefş	menekşe	vilolette	violet
canemerg, gula bê miraz	kardelen	perce-neige	snowdrop
leylaq	leylak (fasça lila'dan)	lilas	lilac
bûkik, bûkanî, gulebûk	gelincik	coquelicot	poppy
guharok	küpe çiçeği	fuchsia	fuchsia
sinbil	sümbül (farsça sunbul)	jacinthe	hyacinth
sîwanok	şemsiye çiçeği	ombellifère	umbellifer
gulqedîfe	kadife çiçeği	amarante	amaranth

Termên Edebî

Amadekar : Rojen BARNAS

Zengîniya zimanekî ji zengîniya bêje û termên di wî zimanî pêk tê. Term, nav an nasnavê mefhûmên ilmî û hunerî ne. Edebiyat ji alîkî ve ilm, ji alîkî ve jî hunermendî ye. Ji bo nasîn, lêkolîn, nerxpêdan û bi nasîn dayina ilmekî an hunerekî hewcedariya meriv bi van nav an nasnavên taybetî (term) heye, ku ji vê hewcedariyê termînoloji hatiye afirandin, da herkes ji gotinekê an ji nasnavekî eynî tiştî fêm bike.

Wekî her zimanê zindî û yê afirandina fikr û hunerê, hewcedariya zimanê me jî bi termînolojiya şaxên ilmê û hunerê cihê cihê heye. Ji vê dîtinê em bi rê ketin û me xebata bihevgihandina termên edebî da ber xwe.

Me bernameye xwe ya «termên edebî» ji edebiyata klasîk ber bi edebiyata nûjen danî. Di vê hejmarê de giranî li ser termên edebiyata klasîk, di hejmara bê de nîvî dê li ser edebiyata klasîk û nîvî jî li ser ya nûjen be. Di xebatên pêş me de li gora hewcedarî û fersendê emê li ser termên edebiyata cihanî jî rawestin.

Bi kurmancî binavkirin an tesbîta rastnivîsîna terman xebata hevalên beşdarî civîne ye. Hin term hene ku ew bi xwe erebî ne; wekî *xezel, qesîde, mesnewî* ku di giştî edebiyatên Rojhelata Navîn de wisa tên binavkirin, ji bona wan navekî kurdî danîn ewçend ne pêwist e.

Kurmanciya termên vê xebatê bi tinê di maneya wan a edebî de ye. Hin term gengaz e ku di zimanên dinê de ji bilî edebiyatê di hin şaxên ilm û hunerên de jî bêne bikaranîn û maneyên wan ên cihê hebin. Lê kurmanciya wan her di maneya wan a edebiyatê de hatiye danîn. Divê xwendevan lê miqate bin.

Di amadekirina vê de, min metoda «rêber» an «ansîklopedî» hilbijart ku di pêş de ev bibe binaxeya «rêbera edebiyata kurmancî» an «rêbera termên edebî». Ji vê bonê heta diva me bi nimûne û şema terman îzah kir.

Hêvidar im ku ne îro be jî siberoj bi kêrî hewcedaran bê.

Edebiyat : Di maneya fereh de navê giştî yê hemî tiştên devkî û nivîskî yên hunermendî, zanistî û pêşeyî ye.

Edebiyata bedew : Navê giştî yê hemî hunerên devkî û nivîsikî ye ku şi'r, roman, tiyatro, çîrok, û h.w.d dikevine navê.

Edebiyata pêşeyî : Navê giştî yê nivîsarên zanistî(tib, matematîk, fîzîk) û yên pêşeyî (meslekî) ye.

Pêşe : Kar, meslek

Vegotin : (vebêje)/**vegêrîn** (vegêre) Çîrokek, bûyerek, serpêhatiyek gotin.

Vebêj / vegêr : Ew kesê ku tiştekî vedibêje.

Riyên vegotinê : Riyên ku meriv xwezî û daxwaziyên xwe pê vedibêje, ku ev dido ne

1. **nesr /** pexşan: Vegotina bê kêş û bê aheng, wek axaftina rojane.

2. **nezm** : Vegotina bi kêş û beşavend.

Mensûr : Berhemên bi nesrê hatine vegotin.

Menzûm : Berhemên bi nezmê hatine vegotin.

Edebî 1. Tiştê ku bi edebiyate re têkildar e, 2. Berhema ku di warê hunermendiya edebiyata bedew de xwedî rûmetekî ye.

Kêş : Wezin, pîvan

Kêşên çendahîn : Weznên bi jimarên kîteyan çêdibin.

Çendahîn : Kemmiyet, kantite

Kêşên çawahîn : Kêşên ku li gora hêjayiya kîteyan -wek kîteya dirêj û kurt, ya vekirî û girtî- çêkirî.

Çawahîn : Keyfiyet, kalik.

Kêşa kîteyî : Kêşa ku li gora jimara kîteyan çêdibe.

Rawest : Di kêşên kîteyî de cihê rawestinê ye. Herwekî di kêşeke 4+4+3=11 de, rawest di pey kîteya çaran û ya heştan de tê. Ku kêş 4+3+4=11 be wê gavê rawest di pey kîteya çaran û heftan de heye. Ku kêş 5+6=11 be rawestek bi tenê heye û ew jî di pey kîteya pêncan de tê.

Kanî Dêrşew, / ka Herekol, / ka Kepir
Ka zozanên / Bavê -Têlî / ka kê bir

Dibêjin ku / Birca-Belek / hilweşî
Text û bextê / botiyan de / ka geşî
(Herekol Azîzan)

Rewest bi nîşandeka (/) hatiye nîşandan.

Kêşa erûzê : Kêşeke çawahîn e, ku li ser bingehê dirêjî û kurtî, vekirîbûn û girtîbûna kîteyan çêdibe. Ji edebiyata ereb derbasî edebiyata faris û ji edebiyata faris jî derbasî edebiyatên klasîk ên welatên musilman biye. Nezmên edebiyata kurd ên klasîk gişt bi vê kêşê hatine nivisandin.

Qalib : Kêşa rêzeke nezmê ye, ku ji çend perçeyên («cuz») kêşê pêk tê.

Herwekî
Di fesla nûbiharê da digel dîlber biçin geştê
Ji ew xweştir "umur nabit, li min ew hal qewî xweş tê.
(Xanî)

Di fes la nû	*bi har ê da*		
di gel dîl ber	*bi çin geş tê*		
Ji ew xweş tir	*'u mur na bit,*	*li min ew hal*	*qe wî xweş tê.*
Me fa 'î lun	me fa 'î lun	me fa 'î lun	me fa 'î lun
. / / /	. / / /	. / / /	. / / /
--------------------	--------------------	--------------------	---------------------
c u z			

----

q a l i b

Pevgihandek : Ji bona vekirî xwendina kîteyeke girtî, dengdara (konson) dawiya bêjeyekê jê veqetandin û bi gihandina bêjeya di pey a ku bi dengdêr(voyel) destpêkirî xwendin e. Herwekî:

Hin gul û hin enber in, hin şîrîn û esmer in.
(Cizîrî)

Meriv dikare vê rêzê bêje bi bêje ji hevûdu veqetandî (bi «fesil») bixwîne;

Hin / gul / û / hin/ enber / in,/ hin/ şîrin/ û es mer /in.

û meriv dikare bi awayê jêrîn bixwîne;

Hin gu / l û / hin / enbe / r in / hin şîrî / n û es me / r in.

Li vê derê di «**gu / l** û», « **r in**», «**n û** » de pevgihandek hatiye kirin ku dengdara dawiya «gul», «enber», «şîrîn», «esmer» bi dengdêra serê bêjeya berî xwe ve bi riya xwendinê hatiye gihandin ku pevgihandek ev e. Ji vê re «wesil» jî tê gotinê.

Jêveqetandek : Jê re fesil jî tê gotinê ku berevajiyê pevgihandekê ye. Çi pevgihandek û çi jêveqetandek ji bona ahenga kêşê tê kirinê. Jê re «fesil» jî tê gotinê. (Binêre li nimûne-ya pevgihandekê).

Kîteya vekirî : Kîteya ku bi dengdêrekê diqede, herwekî *ba, şe, rê, bi, kî, ko, du, zû.*

Kîteya dirêj : Kîteya ku bi dengdêreke dirêj (*a, ê, î, û*) diqede.

Kîteya kurt : Kîteya ku bi dengdêreke kurt (*e, i, o, u*) diqede.

Kîteya girtî : Kîteya ku bi dengdarek (konson) diqede, herwekî *kal, berf, zêr, cil, pîr, bor, kûr, cur.*

Beşavend : qafiye. Drûvpêketina dengan a di kîteya dawin a bêjeyan de ye.

Beşavenda çaryek : beşavenda ku bi nêzedengdarekê diqede «**guj**» û «**kaş**».

Nîvbeşavend : beşavenda ku bi dengdareke wekhev diqede «**mil**», «**pal**», «**bel**».

Tu yî qadir bi yek emrê te yê «kun!»
Mukemmel bûye alem bêserûbin
(∑êx Eskerî)

Beşavenda tam : beşavenda ku bi dengdêrek û dengdarek wek-hev biqede «**mil**», «**kil**», **«dil**».

*Îd e îro bê qerar im ez ji feqda dêmdu***rê**
*Bê hebîb im, bê hebîb im, bê hebîb im, bê heb***îb**
Herkesek ba yarê xwe d'meşyan di sehrayan li rê
Pur keîb im, pur keîb im, pur keîb im, pur keîb
(∑êx Evdirehmanê Axtepî)

Beşavenda zengîn : beşavenda ku dawiya wan bi diduyan zêdetir dengdar û dengdêrên wekhev biqede «**man**», «**zeman**», «**deman**», «**ziman**», «**guman**».

Gelî biran werin cengê
Bişoyin dil ji vê jengê
Bibêjim ez heta kengê
Nehin yek j'me bi vê rengê
(Mustefa Ehmed Botî)

Beşavenda hevdeng : beşavenda ku bi du an zêde gotinên dengdar û dengdêrên wan wekhev, lê maneya wan cihê tê çêkirin

Şahînşehê textekê ***Medîne***
Mu'ciz ji te ew qeder ***me dîne***
(Xanî)

Beşavenda rast : beşavenda ku wek rêza *aa, bb, cc, dd* li dû hev tên.

Binve xweşiya dil û du çavan (a)
Dadê ji te re her ro nîgehban (a)
Da zû tu mezin bî Bedir-Xan (a)
Binve kezeba min bin ve lo! lo! (b)
(Emîr Alî Bedir-Xan)

Beşavenda çeprast : beşavenda ku wek rêza *a b a b, c d c d*, tê danîn.

Hê ji min dil herişandê (a)
Suhtiyê arê te me (b)
Hiş û aqil şewişandê (a)
Sews û bîmarê te me (b)
(Osman Sebrî)

Beşavenda pêçayî : beşavenda ku li rêza *a b b a* tê danîn.

Bedewî çilmisî l'ber pêlên zeman (a)
Lê şabaş! di dêlvê jîrîtî geş bû (b)
Dilbera ku di wextê de keleş bû (b)
Gula geş e, li baxê aqilmendan (a)
(R.Barnas)

Redîf : bêje an kîteyên di nivîsandin û maneyê de wekhev ên di dawiya beşavendê de tên.

Bizan ko min ***yar*** *ti wî*
Dil jî ***birîndar*** *ti wî*
(Feqiyê Teyran)

yar û birîndar beşavend in.
ti wî redîf e.

Rêz : rêza nivîsarê ya nezmê an nesrê.
Malik : beyit. Durêzeya nezmê.
Azade : rêza bi serê xwe ya nezmê ku ne bi malik an bi perçekî nezmê ve ye.
Takemalik : malika bi serê xwe ku ne di nav xezel an qesîdekî de ye.
Malika destpêkî : metle'.Di xezel û qesîdeyan de malika destpêkirinê.
Xweşmalika destpêkê : husnî metle'. Malika diduyan a xezel an qesîdeyê.
Xweşmalika dawiyê : husnî meqte'. Malika diduyan a paşî ya xezel an qesîdeyê.
Malika dawîn : meqte'. Malika dawîn a xezel an qesîdeyê ku di xezelan de navê şair di vê malikê de derbas dibe.
Şahmalik : şahbeyt, beyt ul xezel.Malika herî bedew a xezelê.
Bend : koma rêzên nezmê ku ji çar, pênc, şeş... deh rêzan pêk tên.
Xezel : teşeya sereke ya nezma edebiyata dîwanî ye. Ji malikan pêk tê. Bi gelemperî, bi hindikî ji pênc malikan dest pê dike û heta bîst, bîst û pênc malikan jî dirêj dibe.
Numûne

XEZEL

"Er"er xerame bi qedd û qamet
Yek bûse da me bi sed qiyamet
malika destpêkî (metle')

Yek bûse bexşî ewwel bi îhsan
Axir li min kir cirm û xeramet
xweşmalika destpêkê(husnî metle')

Ji jeng û zerqê da dil bişotin
Cama sedef bîn rind û keramet

Ji herdû çeşmên te y' mest û xûnrêz
Nûra du çeşman kê dî selamet

Li derdû êşan peykan û nîşan
Me j' herdû çeşman kifş in 'elamet

Ruswayê 'işqê tenha ne ez bûm
Kes dî zemanan hub bê melamet
sahmalik(beyt ul xezel)

Du secde ferz in filhal bibin ber
Dema xuya bit ew qed û qamet
Da eybê rindan nekî bi badî
Nufûsu qewmîn biha tesamet
xweşmalika dawiyê (husnî meqte')

Mela li 'umrî bêfayde bûrî
Kêşa bi zoran qehr û nedamet
malika dawîn (meqte')
(Melayê Cizîrî)

-------------------------------- a
-------------------------------- a
-------------------------------- b
-------------------------------- a
-------------------------------- c
-------------------------------- a
-------------------------------- d
-------------------------------- a
-------------------------------- e
-------------------------------- a
-------------------------------- f
-------------------------------- a

Xezela rêzkirî : xezela ku rêzên wê di nîvekê de jî bi beşavend e û gava meriv rêzê di nîvî de dişkêne malik dibe kerte. Jê re xezela musammat jî tê gotin.
Numûne

Serwînazê **serfirazê** şubhê zêr remza **mecazê**
Dame ber çakûç û **gazê** dil ji min bir dil ji min
malika xezela rêzkirî
(Melayê Cizîrî)

Serwînazê serfirazê
Şubhê zêr remza mecazê
Dame ber çakûç û gazê
Dil ji min bir dil ji min **kerte**

Nezîre : carina şair ji xezelekê ku şairek din nivisandiye gelek hez dike. Ji ber vê hezkirinê an ji ber rêzgirtina wî şairî, şair xezelek dinivisîne ku ev xezel bi babet, kêş, beşavend, redîf, di dirûvê wê xezelê de ye.
Qesîde : ji curên nezmê yên edebiyata dîwanê ye ku bi mebesta pesindayin an navnokirina yekî an tiştekî tê nivisandin. Teşeyê qesîdeyê wek yê xezelê ye, ji malikan pêk tê. Malikên qesîdê ji sihî heta not û neha ne. Lê yên zêdetir jî hene.
Avakirina qesîdeyê bi gelemperî li gora vê rêzê çêdibe
1. **Xweşkirin** (teşbîb) bira pêşî ya qesîdeyê ye, ku şair bi teswîrkirina tiştekî dest bi qesîdeya xwe dike. Ev teswîr dibe a cejn, bihar, bajar, şûr, roj, gul, havîn, payîz, zivistan, hesp, sunbil, remezan û h.w.d be.
2. **Gurîzgeh** malika derbasok a ji bira «xweşkirin»ê derbasî bira mebestê ango pesindanê bûn e.
3. **Pesindan** (medhiye) bira bingehî ya qesîdeyê ye ku mebesta şair di vê de kom dibe. ∑air di vê birê de pesnê merivekî mezin dide.
4. Texezzul xezela di pey pesindanê de ye.
5. Xwepesindan(fexriye) di vê birê de şair pesnê xwe dide.
6;Tacmalik malika ku navê şair tê de derbas dibe, ku ev malik di dawiya bira xwepesindanê(fexriye) de tê.
7. Hêvî(du'a) di vê birê de şair ji bo ew kesê ku pesnê wî daye duayên qenc dike, û bi vê birê qesîde diqede.

Mesnewî : yek ji teşeyên nezma edebiyata dîwanê ye, ji malikan tê honandin û her malik di nav xwe de hevbeşavend e. Di babetên dirêj û çîrokan de ev teşe tê bikaranîn. Mem û Zîn û Mewlûd bi vî teşeyî hatine nivîsandin.
Kerte : qit'e. Bi hindikî ji çar rêzan pêk tê.
Sêyîn : perçeyên sêreze ne.Hevaxaftina Melayê Cizîrî û Feqiyê Teyran bi sêyîna ye.
Çarîn : rubaî
Çarane : murabba'. Ji bendên çar rêz pêk tên.
Pêncane : muxemmes. Ji bendên pênc rêz pêk tên.
Sesane : museddes. Ji bendên şeş rêz pêk tên.
Heftane : musebba'. Ji bendên heft rêz pêk tên.
Hestane : musemmen. Ji bendên heşt rêz pêk tên.
Nehane : mustessa. Ji bendên neh rêz pêk tên.
Dehane : mueşşer. Ji bendên deh rêz pêk tên.
Çaranekirî : terbi'. Bi du rêz zêdekirina li malikên xezela şairekî dinê çêkirina çarane ye.
Çaraneya hevrêz : çaraneya ku rêza çaran a benda pêşî di dawiya her bendî de tê tekrar kirinê.
Çaraneya hevbesavend : çaraneya ku rêzên dawîn ên her bendê bi rêza dawî ya benda pêşî re hevbeşavend e.
Serdeyî : ji bona çêkirina çaranekirî(an pêncanêkirî, şeşanekirî, ... dehanekirî) li serê malikên xezela dê bê çaranekirin (û yên din) zêdekirina bi du rêzan e. Di pêncanekirinê de sê, di dehanekirinê de heşt rêz tên zêdekirin.
Nêvdeyî ji : bona çêkirina çaranekirî (an pêncanekirî... dehanekirî) di nav rêzên malikên xezela dê bê çaranekirin (an yên din) zêdekirina bi du rêzan e. Di pêncanekirinê de sê rêz, di dehanekirinê de heşt rêz lê têne zêdekirin.
Numûne

- - - - - - - - - - - -
- - - - - - - - - - - - - malika xezela ecibandî

x x x x x x x x x x x x x x x x
x x x x x x x x x x x x x x x x du rêzên çaranekirinê yên şair

x x x x x x x x x x x x x x x x
x x x x x x x x x x x x x x x x (serdeyî)
- - - - - - - - - - - - - - -
- - - - - - - - - - - - - - - çaranekiriya serdeyî
- - - - - - - - - - - - - -
x x x x x x x x x x x x x x x x
x x x x x x x x x x x x x x x x (nêvdeyî)
- - - - - - - - - - - - - - çaranekiriya nêvdeyî

Pêncaneya nehevbesavend : terdiye. Pêncaneya ku rêzên pêncan ên bendan ne hevrêz in û ne jî hevbeşavend in.

Vegerbend : tercî'î bend. Teşeyek ji teşeyên nezma dîwanê ye ku ji bendan pêk tê. Her bend bi drûv mîna xezelê ye û malika dawîn a benda pêşî di nav xwe de hevbeşavend e, ku ev malik(vegermalik) di pey her bendê de bêguhartin tê.
Vegermalik : malika di dawiya bendên vegerbendê de ye, ku erka wê bi vegera li ser benda pêşiyê bendan bi hev ve girêdide.
Girêbend : terkîbî bend. Wek vegerbendê ji bendan pêk tê. Malikên di dawiya her bendê de bi serê xwe hevbeşavend e û erka wê girêdana du bendan e.
Girêmalik : malikên di dawiya bendên girêbendê de nê.
Hunerên edebî : hunerên gotin û vegotinê ne.
Hevdengî : hunerê hevdeng çêkirinê (binêre li hevdeng).
Hevreh : hunerê bikaranîna gotinên ji rehekê ye.
Pircare : tekrîr. Ji bona xurtkirina tesîra gotinê, hin gotin an hevokan pir car dîsakirin e. Herwekî «merheba» yên di Mewlûdê de.

Merheba ey sirrê Furqan merheba
Merheba ey derdê derman merheba

Merheba ey canê baqî merheba
Merheba 'uşşaqê saqî merheba

Merheba ey alî sultan merheba
Merheba ey kanê 'irfan merheba
(Melayê Bateyî)

Jêwergirtin/Jêveguhastin : îqtîbas. Ji bona bihêzkirina gotina xwe, bikaranîna gotinek ji yekî dinê ye. Di edebiyata dîwanî de ev bi piranî bi bikaranîna ayetek an hedîsekî pêxember dihate kirin.
Pêç û belav : lef û neşir. Berê vebîrandina du an çend tiştan e, û di pey de gotina tiştên ku girêdayê bi wan ve ne. Bi vî awayî sîmetriya bêjeyan tê çêkirin.

Bes niye her dil te xûyê Pîrê Sen'anî mesel
Bendê benda kafirê bê dîn û bê îmanekê.
(Pertew Begê Hekarî)

Lêveger : hunereke edebî ye, ku meriv gotina dawîn, an gotineke bingehîn a dawiya rêza an malika berê di serê rêza an malika nû de dubare dike û bi vê, li rêza an malika berê vedigere.

. . . .
Berê xwe da bi min carêk hilîna xadimê çarik
*Me dît hilbû ji wê nalek çi ku zêra **şefeq dabû***

***Şefeq dabû** me qenc dîtin guhar û berben û tîtin*
*Mixalif new' û texlît in, **muresse'** cumle lêdabû*

***Muresse'** teyr û qemçî ne, rex û rex belg û rêşî ne*
Hemî zêr û mirarî ne, li ser eniyê temenna bû.
. . . .
(Bekir Begê Erzî)

Nezaniya bi zanîn : tecahul ul-'arif. Tevî ku meriv bi rastiyê dizane lê ji bo zêdekirina hêza pêjnê, xwe li nezanî datîne.

Xoceyê Xidrî xelet çû kaniya ava heyat
Lêvê le'lê te y' şeker-rêz bê guman ew kanî ye.
(Cegerxwîn)

Xwesbehane : husnî ta'lîl. Bûyîna tiştekî an bûyerekê, ne bi sedemê wê yê rastîn, lê bi bahaneke xweş nîşandayin e.

Telbe kir weslê ji dilber me bi 'inwanî zekat
Go tu ebd î û bi ebdê xwe zekatê nadim.
(Melayê Cizîrî)

Kesandin : teşxîs. Kesayetiya(şexsiyet) mirovan dayina tiştên neheyber wekî dar û ber, û heywanan e. Di şi'r û çîrokan de heywan, û tiştên ne heyber(bi ruh) wek ku xwedî kesayetiya mirovîn bin, ango wek mirov bin bi mirovan re didin û distînin an wek mirovan dilivin.

Tawis bi wî şiklê melîh şermendeyê saqê di reş
Ew qijika gûxwir binêr, qîj qîj dikit»elwan im ez»
(Axayok)

Şermendebûn(berxweketin) û pesindarî taybetiya mirovan e, perçekî ji kesayetiya mirovan e ku bi heywan û tebayan re peyda nabe. Lê li vê derê şair kesayetiya mirovan daye tawis û qijikê ku tawis şermî û qijik jî qure ye.
Peyivandin : întaq. Heywan û heyînên neheyber wekî ku mirov bin, bi peyivîn dayin e.

Rovî gotê ez xulam Ji Kurdistan heya Şam
Min nedîn wek gurê zer Bê mêjî û zirt û ker
(Roviyê Jîr-Osman Sebrî)

Lihevî : tenasub. Bi hev re bikaranîna du an çend gotinên ku ji aliyê mane, babet an cureyî ve têkiliya wan bi hev re hebin.

Serxweşê cama şerbetê dêm şubhê şem'a zulmetê
Horiya d'baxê cennetê serdarê çendîn mehweş e.
('Eliyê Herîrî)

Di vê malikê de serxweş - cam(piyan) - şerbet(mey), şem'(find) - zulmet(tarî), horî - baxê cennetê û mehweş(mîna hîvê/heyvîn) ji aliyê mane, babet û cureyî ve têkildar in.
Pirs : Ne ji bona bersîv stendina tiştekî ku meriv pê nizane, lê ji bona balkişandin û xurtkirina pêjnê hunera gotinê ya bi riya pirsê ye.

Ew çi bejn e, ew çi qamet, ew çi qedd e, dilruba?
Ew çi exbar in, te can de, ew çi durr in, pur buha?
Ew çi narinc û turunc in, ew çi sêv in, sîneca?
Ew çi mehtab in, binagûş, ew çi subh e, nûrfeza?
Rohniya şama firaqê, şem' û mala kê yî tu?
(Macin)

Kî pê dizane?

Gelo kî ji we bi zimanekî ewropî an rohelatî navên dar an kulîlkên jêrîn dizane? Yên ku dizanin bila ji kerema xwe ra ji *Kurmancî* re binivîsînin, arîkariya me bikin.

Ji niha ve spas.

kinêr : darek e ku donê wê di bîrovê didin û ew sax dike.

masîjark : giyayê ku ji bo girtina masiyan bi kar tînin. Li aliyê Hekariyê jê re ***masîcark*** dibêjin, bi bejn e û tayê wê stûr e, havînî û demî ye.

Hun meyweyek bi navê ***germox*** an ***zersik***, kulîlkek bi navê ***xemla bûkê*** dinasin?